

Book Review // Nirxandina Pirtûkan

## Îdyomên Kurdî/ Cildê Pêşin (A-J)

Mehmet Emin Bozarslan, Deng Yayınları, 2024, Diyarbakır, 642 Rûpel, 9786052187326

Azize KOKSUN ÖLMEZ •

**Article Type:** Book Review // Nirxandina Pirtûkan

**Received // Hatîn:** 15.03.2025

**Accepted // Pejirandin:** 22.04.2025

**Published // Weşandin:** 30.04.2025

**Pages // Rûpel:** 186-189

This work is licensed under the Creative Commons

Attribution-NonCommercial 4.0 International

License (CC BY NC)

<https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/>

**Citation/Atif:** Köksun Ölmez, Azize, Nirxandina Pirtûkan, Îdyomên Kurdî/ Cildê Pêşin (A-J), 2025, 12, r. 186-189

### Kurte

Îdyom peyv yan peyvîkên taybet in ku li derê maneya xwe ya ferhengî carna ji aliyê gel ve di hin rewşan de bi maneyeka dî bikar tê anîn. Di kurdî de gelek idyom hene ku dîrok, çand, jiyana rojane, awayê ramana gel bawerî û kevneşopiyên civaka kurdî nîşan didin. Ji ber vê amadekirina ferhengên idyoman ji bo parastina gencîneya çand û zimên rolekê sereke dilîze. Di vê xebatê de em ê pirtûka "Îdyomên Kurdî" ya M. Emin Bozarslan bidin nasîn û derbarê taybetiyên idyomên kurdî de hinek agahiyan parve bikin.

**Peyvên Sereke:** Îdyom, Biwêj, M. Emin Bozarslan, Kurdî

### Abstract

Idioms can be defined as special words or word groups that are used with a different meaning than their dictionary meaning. These phrases that we often use in daily conversations reflect the way of thinking, lifestyle and cultural characteristics of the society they are in. Idioms used in the Kurdish language carry cultural codes, just like in other languages. It is of great importance to record idioms in order to preserve these codes of the language and pass them on to future generations. In this study, we will briefly introduce the first volume of "Îdyomên Kurdî" prepared by Mehmet Emin Bozarslan and talk about the general characteristics of Kurdish idioms.

**Keywords:** Idioms, Dictionary, M. Emin Bozarslan, Kurdish

### DESTPÊK

Mehmet Emin Bozarslan di warê ziman û çanda kurdî de bi kedên xwe yê giranbiha tê naskirin. Ev nivîskarê Kurd ê hêja li bajarê Amedê li gundekî girêdayî qeza Licê di sala 1934an de hatiye dine. Ji salên 1960î heta niha gelek xebatên girîng pêşkêş kirine. Bi taybetî di warê folklor, edebiyat û zimannasiyê de berhemên wî dewlemendiya zimanê kurdî nîşan didin. Pirtûka wî ya ewil bi zimanê tirkî 'Şeyhlik-Ağalık' di sala 1964an de, ya duyem 'Doğu'nun Sorunları' di 1966an de hatine çapkirin. Wî piştî wan pirtûkên xwe yê tirkî, xebatên wergerê kirine. 'Mem û Zîna' Ehmedê Xaniyê û Şerefnameya Bedlisî wergerandiye zimanê tirkî. Li ser kovar û rojnameyên kurdî, destan û çîrokên gelî yê kurdî gelek xebatên wî hene. Di salên dawî de bi navên 'Baxçe Zimên', 'Ferhenga Kurdî', 'Di Edebiyata Kurdî û Folklorê Kurdî De

• Xwendekarê Doktorayê li Zanîngeha Dicleyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Tûrkiye, azize21@live.com, <https://orcid.org/0009-0005-9162-8200> /// Dicle University, Phd Student in Kurdish Language and Culture Department, Tûrkiye, azize21@live.com, <https://orcid.org/0009-0005-9162-8200>

Hûner' xebatên wî yên gelek fire hatine weşandin. Niviskar li ser peyvên pêşyan ên kurdî, stranên kurdî û idyomên kurdî jî gelek xebitiye. Xebatên wî niha jî berdevam in. Herî dawî pirtûka wî ya li ser idyomên Kurdî derketiye (Bozarslan, 2024: 637).

M. Emin Bozarslan bi navê 'İdyomên Kurdi / Cildê Pêşin (A-J)' pirtûkek amade kiriye. Ev berhem ji aliyê Weşanên Deng ve di payîza 2024 de hat çapkirin. Ferheng bi zimanê kurdî-kurdî hatiye amadekirin. Di cilda yekem a ferhengê de tîpên A-J cih digirin. Ferheng ji 642 rûpelan pêk hatiye. Beşên têdayiya berhemê, li gorî ciyên tîpên Alfabeya kurdî hatine rêzkirin. Di vê cildê pêşin de 320 peyvên sereke hene û idyomên pê re têkildar yek bi yek di bin peyvên de hatine dayîn. Nêzî 1200 îdyom bi ravekirin û mînakên bi berfirehî hatine pêşkeşkirin. Di pirtûkê de indekseke cih nagire da ku bikarhêner bi hêsanî hevoka ku lê digerin bibînin. Ji bo ku xwendevan bikarin maneyên wan peyvên ku wateya wan nizanin bibînin û bi hêsanî fêhm bikin di dawîya pirtûkê de li gorî rêza tîpên alfabeya latînî/ kurdî ferhengokek hatiye zêdekirin.

Pirtûk ji aliyê hecmê ve mezin e. Ji bo her idyomekê çend wateyên cuda û şîroveya wê bi zelalî hatiye rave kirin. Bozarslan di amadekirina ferhengê de idyomên ku çavkaniyên wan ji baweriyên gelerî, çîrok û stranên gelî, gotinên pêşyan, edebiyata kurdî ya klasîk in berhev kirine. Ji folklorê kurdî û edebiyata kurdî ya klasîk hin mînakên pêwîst hatine nişandan.

Bozarslan pêşgotina pirtûkê bi naverokek têr û tije nivîsandiye. Di pêşkêşiyê de ewil li ser wateya idyomê û jêderka wê peyvîkê agahî daye. Bozarslan idyom wiha pênase kiriye: "idyom peyv yan peyvîkê ku li derê maneya xwe ya ferhengî carna ji aliyê gel ve di hin rewşan de bi maneyeka di bi kar tê anîn" (Bozarslan, 2024: 5). Piştî pênasayê cihê idyoman di çanda kurdî de anîye zimên. Li ser taybetmendiyên peyvên pêşyan û idyoman sekinîye. Cudahiya di navbera wan de bi gelek nimuneyan şîrove kiriye. Di heman beşê de di bin panzdeh sernavan de jêderên idyomên kurdî nivîsandiye, behsa çîrokên wan kiriye.

İdyomên di pirtûkê de cih digirin, hinek ji wan di nava gel de li ser baweriyên gelerî hatine afirandin. Ew baweriyên gelî ji wan idyoman re bûne jêder. Mînak idyoma "pê û par" nişana oxir wek diayek di xwestina bûkekê de bi awayê "pîroz be, bi pê û par be" tê gotin. Hinek idyom jî ji çîrokên gelerî hatine girtin. Bo nimûne bingeha idyoma "dayina kevir li ser dil" ji çîroka "Kêrikam, Sebrikam" tê. Di vê çîrokê de tê gotin ku pîrejineka sêrkar kevirêkî sêrkiri daye keça padişahêkî û gotîye "dema tu têkevî rewşeka zor û dijwar vî kevirî bide ser dile xwe û bişidîne, ew ê sebrê bide te". Ji ber wê yekê navê vî kevirî bûye "kevirê sebrê". Di hinek idyoman de tesîrê kesên yan jî dewletên hêzdar jî heye. Bo nimûne idyoma "kesê ku dikare çova xwe li çova Şahê Ecem xe" di derheqê kesên wisa hêzdar de tê gotin. Di nava idyoman de mînakên ji edebiyata klasîk jî cih digirin. Helbestvanên berê di hinek berhemên xwe de cih dane idyomên Kurdî. Mesela Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de idyoma "çûyina tiştêkî di mîzgîna tiştêkî dî de" bikaranîye.

"Baxek wî hebû Emirê Zeydîn  
baxê îremê diçû dî mîzgîn"

Melayê Cizîrî di helbesteka xwe de wiha cih daye idyoma "berdana dest ji tiştêkî";

"Dilê bit seydê şahînan

yeqîn dê dest-i jê berdin”  
Heman idyom di helbesta Feqiyê Teyran de jî derbas dibe;  
“Eya bêkesb û bexîne  
Yeqîn aq’le te teksîr e  
Te ya c’wan da bi ya pîr e  
Tu dest jê berde, sehhar e”

Di vê xebatê de raveyên idyoman bi awayekî zelal û têgihîştî hatine dayîn. Çarçoveya bikaranîna wan hatine ravekirin. Hevokên nimune nîşan dane ka di jiyana rojane de îdyom çawa têne bikaranîn û bi wî awayî fêmkirina mijarê ji xwendevan re hêsantir bibe. Di berhemên edebî yên kevn de idyomek hatibe bikaranîn, ev jî wek mînak hatine zêdekirin.

Di dawiya pêşgotinê de Bozarslan pêşniyaza bikaranîna tîpên ‘î’ û ‘i’ kiriye. Weke tê zanîn ku nivîskar hem di ‘idyomên Kurdî’ de hem jî di pirtûkên xwe yên din de tîpên ‘î’ û ‘i’ yê bikar neaniye. Sedemên vê yekê xwestiye ku dûr û direj binivîse û bi mînakên nîşan bide da ku bide zanîn çima awayê rast bikaranîna ‘î’ û ‘i’ ye. Pirtûk, li dû ravekirinên gelek giranbiha yên derbarê idyomên kurdî de, bi ferhengokê û herî dawî de jî agahiyên li ser niviskariya M. Emin Bozarslan dawî dibe.

Pirtûka Bozarslan û xebatên di vê qadê de, ji bo xwendevan, lêkolîner û kesên ku dixwazin kurdî hîn bibin, yê dixwazin kurdî pêşbixin çavkaniyên girîng in, alîkariya parastina zimên û çandê dikin. Ji ber sedemên dîrokî, erdnîgarî û civakî kurdî bi sedsalan weke zimanekî dewlemend li ser bingeha kevneşopiya devkî hebûna xwe parastiye. Civaka kurd li ser hîmê vegotina devkî şewazeke ragihandinê afirandiyê. Îdyom jî beşeke girîng a kevneşopiya devkî ya kurdî ye. Di çanda kurdî de, ku edebiyata devkî lê xurt e, çîrokbêjiya devkî û helbesta gelêrî di parastin û belavkirina idyoman de roleke girîng lîstine. Di kurdî de gelek idyom hene ku dîrok, çand, jiyana rojane, awayê ramana gel bawerî û kevneşopiyên civaka kurd nîşan didin.

Bozarslan dema taybetiyên idyoma kurdî rave dibe dibêje ku idyomên kurdî wek peyvên pêşîyan, wek stranên gelî yê civatan û govendê, wek çîrok û pêkenokên gelî, serweteka neteweyî ya çandê ya pir hêja ye û ji bav û bapîrên me û ji da û dapîrên me ji me re maye. Dema mirov ji aliyê çandê ve li idyomên kurdî dinêre, dibine ku rengê gunditiyê ji wan dîyar dibe. Ev jî tiştekî sirûştî ye. Li ser idyomên kurdî mantiqa gunditiyê ya saf û sade û ya paqij hakim e. Îdyom peyvên bi bandor in mantiq û îmkanên vegotinê pêş dixin, berfireh dikin û xurt dikin.

Ferhenga idyoman ji bo têgihîştina zimên, rast bikaranîna wî û fêrbûna çarçoweya çandê pêwîst e. Her çiqas, ji ber dînamîkên zimên, ne mimkun e ku hemû idyom di yek çavkaniyê de werin komkirin jî, berhevkirina berfireh pêkan e. Ev xebat dikare li qadên perwerdehiyê bigire heta wêjeyê, li lêkolînên akademîk heta axaftinên rojane bibe çavkanî. Em dikarin bibêjin kesên ku dixwazin li cihana rengîn û dewlemend a idyomên kurdî binerin ev pirtûk dê ji bo wan bibe çavkaniyeke sûdewar.

ÇAVKANÎ / REFERENCES

Bozarslan, E. M. (2024). İdyomên Kurdî, Weşanên Deng, Amed

